CEWHERA JIYANÊ JIN E

Dilşah Dargul

Di dema ku mirov mêzeyî jiyanê dike, hin tişt nayên dîtin ango mirov naxweze bibîne. Eger mirov bixweze bibîne jî, dikare baş û rast bibîne. Di warê mêzekirina jiyanê de, mirovan ji tiştên herî biçuk ber bi yên mezin ve diçe, ango ber bi yên mezin ber bi yên biçuk ve diçe.

Ez jî dixwezim, ji ya biçuk ber bi ya mezin ve nêrîna xwe bînim ziman. Mijara ku di serî de tê eqlê min Jin û Zarokin. Li Kurdistan û Iraq ê mijara jinê, hin caran, ji aliyê hin derdorên biçuk ve tên dîtin. Ji ber ku mijara jinê di cewhera jiyanê de, veşartiye. Jina ku ji mala xwe dernakeve ango di malê de hatiye zindan kirin, dema derdikeve derve jî dixin nav çarşefa reş de ku wek rêbaza jiyanê jêre hatiye destnîşan kirin. Jina ku li gorî vê qurala ku hatiye destnîşan kirin rêveneçe û jina ku li gorî vê rastiyê ne meşe bi rêbazên cur be cur ve tê ceza kirin.

Jina ku rasti her curreyên xerabiyan tên, bêyî ku bizanibe, heyfa xwe ji zarokên xwe derdixe. Jina ku ji aliyê zilam ve tê lêxistin, zaroke xwe dixe, dujunên ku ji zilam digre ew jî ji zarokên xwe re dibêje. Dema zarok jî mezin bû, ew jî fêra ku ji dayikê ango babê xwe hîn bûye, nîşanî biçîkên xwe dide. Zaroka ''kiç'' wek koleyekê yê 'kur' jî dişibe bavê xwe.

Eger em bixwezin dahatuyek birûmet û pîroz ji bo zarokên xwe amade bikîn, ji niha de pêwîste em

xwe amade bikîn. Di serî de pêwîste ji jinê re çêr-dijûn û gotinên xerap neyên gotin. Her wiha lêxistin eybek mezine û gunehe. Jin hebûnek pîroze ku pêwîste bê parastin.

Ji ber ku jin bingeha jîyanê ya malbatê ye. Malbatek perwerdekirî, tê maneya zarokên perwerdekirî yên paşerojê. Ger em bixwezin paşerojek paqij û xweşik pey xwe bihêlin, jina ku di cewhera jîyanê de veşartî maye bibînin ku dayika zarokên me ne. Çawe ku ji bo paşerojek piroz, di serî de wacibek mezin dikeve ser milê Mêr, wacibek mezin dikeve ser milê Jinê jî. Jin pêwîste xwe baş perwerde bike û îradeya xwe xûrt bike. Bi îmkanên xwe bixwîne û bibe xwediyê pîşeyek kar û xebatê. Mixabin gelek kiçên me tiştê ku di serî de tê eqlê wan, zewace. Zewac û û xwedî bûna zarokan nayê wê maneyê ku karek mezin biserxistiye. Ji xwe malbat avakirin, karek mezine, lê ji bo mirova zana, xwe bawer û amade, karek pîroze. Ji xwe pirsgerekên mezin di malbatê de destpê bike, kesa/ê xwe perwerde nekirîbe nikare zarok perwerde bike û pêwîstiyên wî yên maddi bi cîh bîne. Jina ku xwe perwerde kiribe û bibe xwediyê pîşeyekê, dikare zarokên xwe jî perwerde bike û paşerojek ronî û geş diyarî wan bike.

Wê demê bikarîn bêjîn em wezîfeya xwe ya dîrokî pêktînîn û civakek pêşketî ava bikîn.

''Çi dema ku mirovan dest ji xwendinê û zanabûnê berda, pîr û kal dibe''

an jî

''Ti mirovek nikare mîrasek pîroz wek ya aile pey xwe bihêle''